KOVARA WE JI DU MEHA CAREK DERTÊ

JI BASINÊ: CUNTA NAVÊ BELEDA DUGEHIRÎNE...

www.arsivakurdi.org

1986 HEJMAR 2

GELEK SPAS

BI DERKETINA KOVARA ÎSOT 16 HEB MILÎTANÊ ME ÇÊBÛN JÎ. EV JI ME RE MERHELEK GELEK GIRING Û JI WE XWENDEVANA RE JÎ MIZGINÎ-YE KE.

EV BI SALA YE PARTÎYÊN ME KURDA LI EWRUPAYÊ XEBAT DIKIN. LÊ ÇI FEYDE HÊ NE GIHÎŞTINE MERHELEKA WAHA WEK ÎSOT DI CAREKÊ DE GIHÎŞTÊ. BI RASTÎ EM BÊJIN, (JI XWE RASTÎ LI ME NEKETÎYE) GEREK EW MIQATÎ MILÎTANÊ XWE BIBIN.

HINEK MILÎTAN JI VAN PARTÎYÊN ME YÎ KURDA DIXWAZIN ÎLHAQÎ ÎSOTÊ BIKIN. LÊ ÎSOT WAN MILÎTANA HETA BI HER HAWAYÎ NECERIBÎNE, NAXWAZE TÊXE BIN KONÊ XWE.

JI BER KÛ ÎSOT NÎYETA DILÊ WAN MILÎTANA NIZAN E. A DUDI YA JÎ MA KA WANA JI PARTÎYÊN XWE RE ÇI KAR-KIRINE KU WERIN BIN KONÊ ME Û RÛYÊ ME YÎ SPÎ BI XWE RE REŞ BI-KIN.

NOT:

EM WAN HERDUYÊN KÛ JI AL-MANÎYA Û WÎYÊ JI FRENSÊ MURACA-TÎ ENDEMATÎYA ÎSOTÊ KIRÎYE QEBUL NAKIN. GIRÎYÊN WAN JÎ BÊ FEYDE YE.

HAYDÊ DI XWEŞÎYÊ DE BIMÎNIN.

ÎSOT

ÎSOT DERKET PERGALA ÇEND KESAN LI HEV KET.
DIBÊJIN WE ÇIMA NAVÊ KOVARÊ NEKIR PÎVAZ, TIRŞIK AN BALÎ-CAN Û HWD. E RÊÊ... ERÊÊÊ... WE KURD KIRIN GIL Û ÇAR PER-ÇA, ÎJA WIN DIXWAZIN ÎSOTÊ JÎ TÊXIN PERÇA. ME Û BRAKÊ ME ZAZA Û HINEKÊ DINÊ BERA PÊXLA HEVDÛ DIN. NA... NA. WIN JI BINÎVE ŞAŞIN, ÎJA FAHŞ NE-BIN! BIRA YEZDAN DI HEWARA WE DE WERE.

SÎNO ZIRNE

XWEDÎ KOMELA YEKÎTÎYA KARKERÊN DEMOQRATÊN KURDÎSTAN
BERPIRSÎYAR Û REDAKTOR MAMOSTE
NAVNÎŞAN AXBYPLAN 5, 163 73 SPÅNGA
TFN 08/760 81 23 POSTGIRO 496 03 75-6
JI DU MEHA CAREK DERTÊ. BUHAYÊ WÊ 10 KR. ABONA SALEKÎ 70 KR
©MaMoste

DI KÛLEKÊ RE :

XEYALÎ NWÊ NÛSEREKANMAN

NÛNERÊ NOBEL

WEK WIN JÎ DIZANIN, ÎSAL MECLÎSA TIRKÎYÊ DIXWAZE JIBO XELATA NOBELÊ KEMAN EVREN NÎŞAN BIDE. LI GOR GOTINA WAN QET KÊMASÎYÊN EVREN TUNE NE. GEREK XELATA NOBELÊ JI WÎ PÊŞTIR NEDIN KESÎ DIN. BI RASTÎ JÎ AXAFTINA WAN JI ALÎKÎ VE DI CÎ DE YE. EGER WIN BAWER NAKIN WERIN EM TEVDA GUH BIDIN XEBERDANA EVREN.



KEMAN EVREN 8 RASTE, RASTE... MECLÎS TIŞTEKÎ RAST KIRÎYE. MA GI KÊMASÎYA MIN JI ENVER SIDAT Û MENAHIM BEGÎN HEYE. DEMA BEGÎN XELQÊ FILISTÎNÊ DIDA BER GULA, QEY EZ LI VIRÊ DI CÎYÊ XWE DE DISEKINÎM? MA MIN JÎ KURDA NEDIDA BER GULA Û WAN NEDIXIST ZÎNDANA?. BEGÎN DI VÎ WARÎ DE JI MIN PIRTIR NEKIRÎYE Û HINEK KÊMASÎYÊN WÎ HEBUN. BEGÎN MUSAADE DIKIR GELÊ FILISTÎNÎ BI ZIMANÊ XWE BIAXIFIN, LÊ MIN ZIMANÊ KURDÎ CAREKÊ JI BINÎ VE MEN KIRÎYE.

EM WERIN SER ENVER SIDAT. SIDATÊ DESTBIRAKÊ MIN DIXWEST BERXWEDANA GELÊ FILISTÎNÊ BIFROŞE EMERÎKA... TEW EZ YA KURDAN Û TIRKAN Û JI MIN BÊ, EZÊ ÊN HINKÎ DIN JÎ BIFROŞIM EFENDÎYÊ XWE YÎ EMERÎKA.

EZ BI HER HAWAYÎ JI BEGÎN Û SEDAT ÇÊTIR IM... EW ŞOVENÎSTÊ KEVNEPEREST IN. EZ MERTEBEK DIN JÎ JI WAN MEZINTIR IM. EZ FAŞÎSTÊ BINAV Û DENG KEMAN EVREN IM. JI ALÎ ÎNSANÎYETÊ VE JÎ MIN PIR KAR Û BARÊ QENC KIRÎYE. JI BO ÎŞKENCE KIRINA ÎNSANA MIN METODNÎ NÛ KIFŞ KIRÎYE. MESELA SEYDAYÊ MINÎ HERÎ MEZIN HÎTLER, ÊN LI HEMBER WÎ (HÎTLER) BÛN BI CAREKÊ VE JI HOLÊ RADIKIR. LÊ EZ WISA NAKIM. ÊN DI ÎŞKENCEXANÊ MIN DE NE, EZ WAN ZÛ BI ZÛ NAKUJIM. BI ELETRÎK, FELEQE, JOB XISTIN, SERSERKÎ DALEQANDIN, BIRGÎ HIŞTIN Û BI HINEK HAWÊ DIN DIXWAZIM WAN BIDIM XEBERDAN. PAŞÊ JÎ WAN BÊ ÊBUQAT BI SALA DI QULÊ DE DIHÊLIM. HÊDÎ, HÊDÎ RIHÊ WAN TÎNIM BER QIRKA WAN. (...) EL HEQ EZ LAYIQÎ XELATA NOBELÊ ME.

DE ÎCAR DI NABERA EVREN Û ÊN XELATA NOBELÊ BELA DIKIN DE MESELE WÊ BI GI HAWÎ BÊ SAFÎKIRIN, EM NIZANIN. TIŞTÊ KÛ EM NIZANIN; WEK KOVARA ÎSOT, ME JÊRE XELATEK BIRÊ XISTÎYE. XELATA ME EVREN NE ÎRO PIR ZÛDE HEQ KIRÎYE. EW JÎ "GERGOYÊ –ÇOPLIXA– TARÎXÊ YE" LÊ PÎROZ BE.

KÎ DIBÊJE TARÎX TEKERUR NAKE./ DIKE Û QÛŞÊ JÎ LÊ DIQETÎNE. MA EMÊ JI WAN, AN JI PEHLÎVANÊ XWE Ê DEMOQRASÎYÊ Ê BI NAV Û DENG JI SLO EFENDÎ BAWER BIKIN. SLO DI-GOT "RÊ BI MEŞÊ NAMEHIN". LÊGI FEYDE ÎRO EW BI RÊYA KETÎ-YE. NIZA WÊ EW BIMEHÎNE?



QELÛN

BI VÊ QELÛNÊ MERIV KARE NÎKOTÎNÊ NÊVÎ BI NÊVÎ KÊM BIKE. ME BUHAYÊ QELÛNÊ HÊ LI SER NEXISTÎYE. JIBER KÛ BUHAYÊ WÊ ÇI DIBE BILA BIBE, EM ZANIN WINÊ BISTÎNIN.



ŞERÊN STÊRKA!

SEREKWEZÎR TEKSAS RÎNGO Û GORBAÇOV LI CENEVRÊ HATIN CEM HEV. ÎSOT MIXABIREKÎ XWE ŞAND CEM WAN.
EW XEBERÊ KU RADYO Û TELEVÎZYON DAN JI XWE WIN DIZANIN. LÊ GAVA KU TEKSAS RÎNGO Û GORBAÇOV TENÊ MAN Û BI HEVDÛ RE MUNAQEŞE KIRIN MIXABIRÊ ÎSOT LI WIR BA WAN BÛ Û JI WE RE VÊ XEBERDANAHANÊ PÊŞKÊŞ DIKE.

TEKSAS RÎNGO : "BIRAYÊ MINÎ GORBAÇOV, TU ZANÎ LI SER ALA ME PIR STÊRK HENE. EZ DIXWAZIM HINKÎ DIN JÎ TÊXIM NAV ALA ME. JIBO VÊ YEKÊ GEREK EZ DEST BI ŞERÊN STÊRKA BIKIM."

GORBAÇOV LÊ VEGERAND:
"EZ VA YE 54 SALÎ ME Û HETA NIHA MIN NEBIHÎST TU BIRAYÊ MIN BI NAVÊ TEKSAS RÎNGO HENE. LÊ KU TU DIXWAZÎ BIRATÎ JIBO VÊ NE HEWCE YE ŞERÊN STÊRKA. LI SER ALA ME JÎ DAS Û ÇAKUÇ HENE. MADEM TU BIRATIYÊ DIXWAZÎ WERE EM DAS Û ÇAKUÇÊ LI HEV PARVE KIN Û DINYAYÊ JI ZILMA BIRAKÊ XWE XELAS KIN. ..."

ŞEMDÎN ÎSOTÇÎ

DIBÊJIN

— DIBÊJIN : KURD BI BER HEV TÊN...
— ME GOT : XWEDÊ YA BI XÊR BIKE.

— DIBÊJIN : XELK JI MÊJDE ÇÛNE SER HEYVÊ.
— ME GOT : MA YA KURDA ÇI JÊ HEYE?

— DIBÊJIN : BÎYANÎ MÎNA KULÎYAN DIGRIN SER SWÊD...
— ME GOT : ME BI XWE CÎYÊ XWE GIRTÎYE.

— DIBÊJIN : KURDÊN ME LI SWÊDÊ JÎ DIÇIN ÇAYXANAN.
— ME GOT : KURMÊ ŞÎRÎ HEYA PÎRÎ.

ÎLANE

EM KURDÊN LI STOCKHOLMÊ DIJÎN JIBO KOMELA XWE A KOMUNÊ AVA BIKIN LI HEFT HEB KURDÊN BETAL DIGERIN.

ENTRÊ "TEŞRÎFBÛN" BÎST KRONE. BÊŞA SALEWEXTÎ NIHA PÊNCÎ KRONE. PAŞÊ LI GOR HÎNKIRINA PERE STENDINÊ (BI NAVKÎ DIN KÛ ENDAM BIŞEMITIN FAQÊ) DIBE SED, DUSED Û HWD.
EM LI HÊVÎ YA BERSÎVA KURDÊN BETAL IN.

www.akurdi.org


LI DORA DÎYARBEKIRÊ
VA YE LI KURDÎSTANÊ TRAQTOR JÎ HEYE. DIVÊ ABORÎYA KURDÎSTANÊ KAPÎTALÎZM BE. HER TIŞT JI BINÎ VE HAT GUHERTIN.
ME LÊKOLÎNEK LI SER BINGEHÎYA ABORÎYA KURDÎSTANÊ ÇÎKIR. EM PÊKÊŞÎ KOMELE Û PARTÎYÊN XWE DIKIN. EV DI TARÎXA KURDÎSTANÊDE A YEKEMIN E KU WEKHA BI FIREH BÛN GÊBÛYE.
LI DORA BÎTLÎSÊ
PIŞTÎ VÎ COTÊ HAN KES NIKARE ÎNKAR BIKE KU BINGEHA ABORÎYA KURDISTANÊ FEODALÎ YE.
LI DORA MÊRDÎNÊ
ROJA WE BI ÇIL BAGNOTÎ YE.. EGER WIN QEBÛL DIKIN DEST BI KAR BIKIN.
AXA RAST DIBÊJE
WA YE AXA NIKARE GUNDÎYA BELAŞ BIXEBITÎNE Û HEQDESTÎYA WAN DIDE. DÊMEK BINGEHÎYA ABORÎYA KURDÎSTANÊ NÎV FEODALÎ YE Û NÎV KAPÎTALÎ YE.

LI DORA XARPÛTÊ

www.serbakurdi.org

QELEMŞORÊ XÎRETKAR

EZ BI XWE NIVÎSKAR IM. JIBO TARÎXA KURDÎ ÇI JI DESTÊ MIN BÊ,JI BO QEZENCÊ TEXSÎR NAKIM. MIN VÊ PIRTÛKA HANÊ JI OSMANÎ WERGERANDIYE ZIMANÊ TIRKÎ. EV XEBAT HEFT SALÊ MIN STEND. PROGRAMA MIN TIJE YE. PIRTÛK LI SER MIN BI SED, SED Û BÎSTÎ RÛDINÊ, LÊ EZ BI ERZANÎ DIFROŞIM WE.

KÊMASÎYA ME EW E KU DI NAV KURDÊN ME DE Ê BI XÎRET HINDIK IN. EZ BI XWE JI KURDÊN ME PIR TIŞTÎ NAXWAZIM. HIMA HINEKÊ BI XÎRET HEBIN, KOVAR Û PIRTÛKA BERHEV KIN, DI NAV HEVDÛ DE BIKARIBIN QOMÎSYONA ÇÊKIN, JI ZIMANÊ FARISÎ, EREBÎ AN OSMANÎ NIVÎSA WERGERÎNIN ZIMANÊ KURDÎ AN TIRKÎ Û JI MIN RE BI-RÊ XIN. HEW EWQAS! BIRA KARÊ GIRAN LI PIŞTA MIN BE. EZÊ BIBIM ÇAPXANÊ, LI ÇAPXANÊ LI SER BIM, BI XWEDÎ YÊ ÇAPXANÊ RE XEBER DIM, PIRTÛKA LI ÇAPXANÊ BIJMÊR IM, JI ÇAPXANÊ BÎNIM MALÊ, LI SER PIRTÛKA BI KÊMASÎ HINEK QONFERANSA BIDIM Û PIRTUKA LI SER NAVÊ XWE BIFROŞ IM. QEZENCA VÎ TIŞTÎ PIR HINDIK E. WEK WIN ZANIN LI SWÊD MOMS JÎ HEYE. ELHEQ WEK PERE TIŞTEK JI MIN RE NAMÎNE. HER TIŞT JI-BO TARÎXA KURDÎ Û KURDAYETÎYÊ YE. ...

"NIVÎSKARÊ ME RAST DIBÊJE. LÊ NIZA VAN KURDÊNDIN LI GOR GOTINA WÎ "ÊN BÊ XÎRET"WÊ ÇI BIKIN? JIBO EW JÎ KARIBIN PIÇEK BIBIN BI XÎRET. BI YA ME EV E. EW JÎ GEREK PIRTÛKÊ NIVÎSKARÊ ME YÎ BI XÎRET BELA BIKIN. JI DÊVLA YEKÊ, NEH DEH HEBA BI CAREKÊ VE BISTÎNIN. JIBO DILÊ NIVÎSKARÊ ME JÎ XWEŞ BIBE Û EW JÎ JI BÊ XÎRETÎYÊ XELAS BIBIN, BIBIN XWEDÎ RÛMET Û KARI BIN LI CEM'ETA NIVÎSKARÊ ME DE BEŞDAR BIBIN."

EMÊ DI ÎSOTÊ DE JI ÎRO PÊVE CÎ BI-DIN KARÎKATORÎSTÊN GELÊN DIN JÎ. DI VÊ HEJMARÊ DE EM HINEK NIMÛNE JI KARÎKATORÎSTÊN SOVYETÎ PÊŞKÊŞÎ WE DIKIN.

JI KOVARA KROKODÎLÊ (TÎMSEH) CCCP
1982 Hejmar 26

КРОКОДИЛИНКИ

YA BAŞ EW E KU MERIV KARIBE BÊ TOP BILEYÎZE...

Рисунок А. БАВЫКИНА, г. Мурманск.



Рисунок Н. БЕЛЕВЦЕВА, г. Белгород.



КОНКУРС ДРЕССИРОВЩИКОВ.

Рисунок Л. ФИЛИППОВОЙ.





Рисунки А. ПАНАСЕНКО, г. Белгород.

Рисунок С. ВЕТКИНА.

www.arsivakurd.org

HINEK "NIVÎSKAR"Ê KURD JI ÎSOTÊ XEYÎDÎ NE. LI GOR GOTINA WAN KÎJAN KOVARA NÛ DERKETÎYE QALA WAN KIRÎYE, PESNÊ WAN DAYE, LÊ ÎSOT QALA WAN NEKIRÎYE Û JI VÊ YEKÊ PIR 'ACIZ BÛ-NE. VAN ZATA DIBÊJIN; "ÎSOT, ÎSOT BE. QAWA WÊ WEK KOVAR DERKEVE Û QALA ME NEKE, FORTÊ ME NAVÊJE."

BI RASTÎ ME BI ZANE BÛN, NE QALA WAN KIR Û NE JÎ TRANÊ (LAQIRDÎ) XWE BI WAN KIR. WEK WIN JÎ ZANIN ÎSOT PIR TÛJ E. YÊ JÊ FAM DIKE DEVÊ WÎ DIŞEWITE. LÊ YÊ JÊ FAM NEKE, NE DEV Û NE JÎ POZ DIŞEWITE. JI ÎRO PÊVE EMÊ TRANÊ XWE BI VAN XORTÊN NAV "NIVÎSKARE" (LÊ BI YWE KEJ NIZANIN GI NE) BIKIN. BELKÎ POZÊ WAN HINEK BIŞEWITE.



ÇALIM ŞEWQÎ

www.sosyalist.net





www.arsivakurdi.org

XWEŞE AN NA



DI BÎSTÊ MEHA YAZDAN DE JI ERMENÎSTANÊ GRUBEK, GOVENDA KURDÎ LI STOCKHOLMÊ PÊŞKÊŞÎ MÊVANA KIR.

DI ŞEVÊ DE RÊ Û RÊVANÎ TUNE BÛ. PIRANÎYA MÊVANAN SÊWÊDÎ BÛN. JI TIRKAN KESEK TUNE BÛ. JIXWE EW NAYÊN ŞEVÊN KURDA. HINEK KURDÊN GELENK Û QEHREMAN JÎ NEMA DIGIN ŞEVA. DIBÊJIN "ŞEV PIR TARÎ NE, ÊN BAŞ ROJ IN!"

JI NÛ VE GEREK EM BIFIKRIN, EQLÊ XWE BIDIN SERÊ XWE. LI RÊYÊN NÛ BIGERIN Û ARMANCÊN PIR TÛJ BIDIN PEŞÎYA XWE. WEHA EV MESELE HEW DIMEŞE. EM GEREK HUR Û PIR KUR Û DUR BIFIKRIN.

JI DÊVLA KU EM BI KARKERÊN TIRKA Û KURDÊN ÇELENG RE PARTÎYAN ÇÊDIKIN EMÊ BI SWÊDÎYAN RE ÇÊKIN. PARTÎYEK YEKTA Û MERKEZÎ BI HER HAWÎ. KA WÊ DEMÊ WÊ ENDAMÊ KÎ ZÊDE BIN. WÊ GELO KÎ KARIBE PIRTIRÎN JI KURDÎSTANÊ RE NAME BI RÊXE Û AXÎNÊ MEZIN BIKŞÎNE.

DE BIRA ÎJA (ÎCAR) TIRK Û KURDÊN ÇELENK NEYÊN ŞEVÊN ME KURDA HA! XWEŞE AN NA ?. JI GIRARÊ RE RÛN, JI ŞOREŞÊ RE "TUN" LAZIM E!

ŞEMDÎN ÎSOTÇÎ

QEHREMANÊ BÊ NAV

UTGIVARE : KURDISKA DEMOKRATISKA ARBETAR INION.
ANSVARIG & REDAKTÖR: MAMOSTE
ADRES : AXBYPLAN 5, 163 73 SPÅNGA
TFN 08/ 760 81 23 POSTGIRO 496 03 75 - 6
PRIS : 10 KR. 10 FF. 3 DM. PRENUMERATION 70 KR